



## Mîtos û Edebîyat Mîtosên Kurdo-Îranî di Edebiyata Kurdî de

Shahab Vali – Kenan Subaşı (Ed.), Nûbihar, 2023.

384 rûpel, ISBN: 978-625-7383-72-1

Engin ÖLMEZ

<b>Engin ÖLMEZ</b>	Engin Ölmez   <a href="https://orcid.org/0000-0002-6655-188X">https://orcid.org/0000-0002-6655-188X</a>   enginolmezz123@gmail.com Xwendekarê Masterê, Zanîngeha Mardîn Artuklu, Beşa Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn-Türkiye
<b>Jêgir</b> Citation Atf	Ölmez, E. (2024). Mîtos û Edebîyat Mîtosên Kurdo-Îranî di Edebiyata Kurdî de, Shahab Vali – Kenan Subaşı (Ed.), Nûbihar, 2023. 384 rûpel, ISBN: 978-625-7383-72-1. <i>Artuklu Kurdology</i> , (17). , 78-81
<b>Dîroka Şandinê</b> Submission Date Geliş tarihi	08.09.2024
<b>Dîroka Qebûlê</b> Acceptance Date Kabul Tarihi	26.09.2024
<b>Dîroka Weşandinê</b> Publication Date Yayın tarihi	30.09.2024
<b>Cureyê Gotarê</b> Article Type Makale Türü	<b>Danasînên Pirtûkan</b> Book Review Kitap Tanıtımı
<b>Hakemî</b> Peer-Review Hakemlik	<b>Cot Nenas – Du ji derve</b> Double anonymized - Two External Çift Taraflı Kör Hakemlik – İki hakem
<b>Beyana Etîk</b> Ethical Statement Etik Beyanı	<b>Hafîye beyankirin ku di pêkanîn û nivîsina vê xebatê de hemû rêzikên zanîstî û etîk hatine şopandin û hemû çavkanî bi awayekî têkûz hatine referanskirin</b> <i>It is declared that scientific and ethical principles have been followed while carrying out and writing this study and that all the sources used have been properly cited.</i> Bu çalışma yapılırken ve yazılırken bilimsel ve etik ilkelere uyulduğu ve kullanılan tüm kaynaklara uygun şekilde atıfta bulunulduğu beyan edilir.
<b>Kontrola İntihalê</b> Plagiarism Checks Benzerlik Kontrolü	<b>Nexêr</b> Hayır No
<b>Nakokiyên Berjewendiyar</b> Conflicts of Interest Çıkar Çatışması	<b>Di gotarê de di navbera nivîskar û ti aliyên din nakokîya berjewendîyê tune ye.</b> <i>There is no conflict of interest between the author and any parties in the article.</i> Yazar ile makalede yer alan taraflar arasında herhangi bir çıkar çatışması bulunmamaktadır.
<b>Alîkarîya Darayî</b> Grant Support Maddi Destek	<b>Nivîskar beyan dike ku wan wî ji bo vê vekolînê ti fonên derveyî wernegirtine.</b> <i>The author(s) acknowledge that they received no external funding in support of this research.</i> Yazar(lar), bu araştırmayı desteklemek için herhangi bir dış fon almadıklarını kabul etmektedirler.
<b>Mafê Telifê &amp; Destûr</b> Copyright & License Telif Hakkı & Lisanslama	<b>Nivîskar li jer lîsansa CC BY-NC 4.0 mafê xwe yê li ser xebata xwe diparêzin.</b> <i>Authors publishing in the journal retain the copyright to their work licensed under the CC BY-NC 4.0.</i> Dergide yayın yapan yazarlar, CC BY-NC 4.0 kapsamında lisanslanan çalışmalarının telif haklarını saklı tutarlar.

Em dikarin bibêjin piştî salên 2010an, bi vebûna beşên ziman û edebîyata kurdî, xebat û lêkolînên ziman/edebîyat û qada mîtolojîya kurdî êdî pêlek li xwe daye û zêdetir bûne. Herçiqas metn, karakter, naverok û Şahnameyên Kurdî di nav gel da bi awayekî devkî hatibine vegotin û berhevkerin jî, qismê teorîk yê xebatên mîtolojîya kurdî û analîz û lêhûrbûnêka akademîk heta radeyekê qels mane. Herwiha çend xebat ji aliyê hinek şexsan ve hatibin kirin jî, heta radeyekê ji perspektîf û bînahîyeka akademîk dûr in. Çi ji ber sedemên polîtîk û civakî bin çî jî ji ber rewşa kurdî ya berdest be (kêmbûna lêkolêr û pisporên qadê, zext û bişaftinên li ser kurdî, parçebûna xak û zimanî û hwd), qismen, xebat û lêkolînên li ser qadên kurdî pirtirpirtir û sethî mane û bi derengî ketine. Ev jî bûye sebeb ku kulîyateka hevpar ya xebatên kurdî (kurmançî, soranî, goranî, zazakî) çênebe. Lêbelê çend geşedan û hewldan bûne sebeb ku bi demê ra, di qadên cuda da û ji aliyê pisporên qadê ve, kulîyateka xebatên kurdî derkeve meydanê û rê li ber nîqaşên nû yê qadên şêlû veke. Hebûn û deskefta enstîtu û beşên kurdî li bajar û welatên cuda yek ji wan geşedanan e ku rê li ber zêdetir xebatên kurdî yê akademîk vekirîye û qadêka lêkolînê ava kirîye. Em dikarin bibêjin ku qada mîtolojîya kurdî jî yek ji wan qadan e ku lêkolîn û xebatên li ser wê bi derengî ketine û bi xêra deskeftên navborî êdî zemînekî bo xwe ava dike di nav kulîyata kurdî da. Qada mîtolojîya kurdî jî yek ji wan qadan e ku xebat û kulîyateka wê ya teorîk çêdibe. Yek ji wan xebat û berheman jî *Mîtos û Edebîyat: Mîtosên Kurdo-Îranî di Edebiyata Kurdî de* ye ku ji 8 gotarên konsantre yê di peywendîya mîtosê de, ji layenên cuda û ji aliyê kesên cuda ve hatine nixandî. Em dê di vê nivîsa xwe da li ser berhema *Mîtos û Edebîyatê* bisekinin ku ji weşanên Nûbiharê hatîye çapkirin û amadekarî û edîtorîya wê ji aliyê Shahab Valî û Kenan Subaşî ve hatîye kirin.

Gotara ewil ya kitêbê, ya Shahab Valî ye bi navê “Mîtos, Mîtolojî û Edebîyat”. Gotar ji destpêk û ji du binbeşan pêk tê bi navê “Pênasekirina Edebîyatê” û “Mîtos û Edebîyat”. Valî di temamiya xebatê da li ser aliyê teorîk yê mîtolojîyê sekinîye û peywendîyek di navbera mîtos, mîtolojî û edebîyatê da danîye. Em dikarin bibêjin ku ev gotar bûye pal û piştêka teorîk jî ji bo gotarên din yê kitêbê ku wî ji gelek zana û pisporên qadê û ji nêrînan cuda yê derbarê mijarê da îstifade kirîye û bîngeha xebatê danîye. Wî cih daye nêrînan cuda yê derbarê peywendîya navbera mîtos û edebîyatê da û di encamê da ligel ku fikrên dijber hene jî, pêwendîya mîtos û edebîyatê nehatiye înkarkirin. Valî ji bo piştrastkirina pêwendîya navbera mîtos û edebîyatê çend nimûneyan ji edebîyata cihanê destnîşan dike, wekî Gilgamiş, Şahnameya Firdewsî, Homeros, Bewolf û hwd.

Sami Çelîktaş bi gotara xwe ya bi navê “Teorîyên Lehengê Mîtolojîk” beşdarî di kitêbê da kirîye. Çelîktaş xebata xwe di bin sê beşan da dabeş kirîye: Pênaseya Leheng, Leheng Weku Arketîp û Teorîyên Lehengê Mîtolojîk. Ew di vê xebata xwe da li ser nêrînan û têgehên sereke yê derbarê lehengên mîtolojîk da sekinîye ku lehengan ji berê heta niha di navenda vegotin û neqilkirinan da cihê xwe qewî kirîye. Wî di xebata xwe da piştî xwe daye teorîsyenên wekî Otto Rank, Maurren Murdock, Lord Raglan û Joseph Campbell. Piştî şirove û pênaseyên derbarê serpehatîyên lehengan da, ew bi rêya teorîyên têkildar, mijarê berfirehtir dike û zêdetir li ser teorîya Joseph Campbell û 17 qonaxên rêwîtiya lehengan radiweste û wan qonax û teorîyan şirove dike.

Kenan Subaşî bi du gotaran pişkdar e di kitêbê da. Gotara ewil ya Subaşî bi navê “Kesayetên Mîtolojîk û Rengvedanên Wan di Edebiyata Gelêrî ya Kurdî da” ye. Gotar li ser pêwendîya navbera mîtos û folklorê ye ku bi rêya leheng û kesayetên mîtik ên di metnên folklorê da cih digirin. Ew li ser karakter û lehengên mîtik yê di metnên folklorê da, şecereya lehengan destnîşan dike û li ser paşxaneya rolên karakteran disekine ku di encamê da tê dîtin ku ew karakter (rol), leheng û vegêrana wan xwe digihîne dîrokeka kevna û nediyar, yanî mîtosê. Karakter û lehengên di metnên folklorîk da, yê kurdo-îranî ne û herwiha yê tûranî ne. Gotar balê dikêşe ser hindê ku naverok, karakter, rûdan û qewimînên edebîyata gelêrî li ser şop û berdewamiya mîtolojîya Îranê ne û tê zanîn Îran teqabîlî cografyayekê dike ku kurd jî beşek ji wê cografyayê ne.

Gotara duduyan a Kenan Subaşî li ser “Dêw û Formên Wan di Folklorê Kurdî da” ye. Gotar di bin

du beşan da hatîye dabeşkirin: “Dêw: Taybetî û Tezahurên Wan” û “Formên Dêwan û Sêhrên Wan”. Gotar bi giştî li ser folklorê kurdî, dêw û formên wan di nav kurdên yarsan û êzdî da disekine. Subaşi, bi rêya mînakên dêw û mexlûqatan balê dikêşe ser pêwendîya navbera mîtos û kevneşopî, bawerî, rabûn û rûniştin û çanda kurdî ku ew wekî îdyom û bawerî li nav xelkê berbelav in. Bi rêya çend mînakên dêw û formên wan, ew li ser erk û rola wan û bikaranîna wan disekine ka çawa û bi çi awayî di nav metn û xelkê da cih digirin û bawerîyeka çawa pê heye ku ev dêw û bawerî bi mîtosê ve têne girêdan.

Yakup Aykaç bi gotara xwe ya bi navê “Şah û Pehlewanên Mîtolojîk di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de” beşdarî di kitêbê da kirîye. Aykaç di vê gotara xwe da, bi rêya şah û pehlewana edebîyata kurdî ya klasîk di peywendîya mîtosê da, li ser şah û pehlewana kurdo-îranî disekine ku di dîwanên klasîk ên kurdî da cihêkî zêde digirin. Ew di temamîya nivîsa xwe da li ser 20 şah û pehlewana sekinîye, şecereya wan derxistîye û ji bo her şah û pehlewana jî diwanên cuda yên kurdî çend beyt destnîşan kirine ku di wan beytan da navê wan derbas dibe an jî bi rêya amûrekê û bi saya hunerên bedew ên edebîyatê ew hatine destnîşankirin. Ew, bi destnîşankirina wan şah pehlewana diyar dike ku têkilîyeka xurt di navbera edebîyata klasîk û mîtosê da heye ku kurdo-îranî ne û aîdê kurdan e jî, yanî aîdê cografîyeyekê ye.

Mehmet Şirin Filiz bi gotara xwe ya bi navê “Ji Mîtosê ber bi Logosê Çavkanîyên Mîtolojîk yên Helbesta Kurdî ya Modern” beşdarî di kitêbê da kirîye. Filiz bi rêya çend mîtosan, têkilîyekê datîne di navbera mîtos û edebîyata modern da ku ew di helbestên modern da li pey şopa mîtosan ketîye û di helbestan da karakterên mîtik û mîtos destnîşan kirine. Ew li ser giringîya mîtosê ya di edebîyata modern da jî sekîneye ku di serdema modern da netewe, mîtosan wekî amûrê hebûna xwe dibînin û xwe dispêrin tarîxên kevn ji bo îsbatkirina neteweya xwe. Filiz ji bo her karekterêkî mîtik û mîtekê, çend nimûneyan ji şairên helbesta kurdî ya modern dide û hebûna wan karakter û mîtan bi saya wan helbestan, di helbesta kurdî ya modern da destnîşan dike ku ev jî nîşaneya hafîzeyeka kolektîf û aîdîyetekê ye di nav kurdan da ku wan mîtan heta roja me di bîr û bawerîyên kurdan da cihê xwe qewî kirîye û li ser zar û zimanê gel gerîyane û paşê ji qelemê şairan nizilîne ebedîyetê.

Gotareka muştêrek jî heye di vê kitêbê da bi navê “Kesayet û Heyberên Mîtolojîk di Edebiyata Goranî/Hewramî de” ku ji aliyê Shahab Valî û Cumhur Ölmez ve hatîye nivîsîn. Di destpêka gotarê da çavkanîyên mît û mîtolojîya kurdan (goranî/hewramî) hatine destnîşankirin û cureyên edebîyata goranî hatine dabeşkirin ku paşê ew cureyên edebî di bin du serenavan da, “Metnên Dînî Yên Kurdên Yarsan” û “Şahnameyên Kurdî”, hatine kategorîzekirin. Naverok, çawanî û paşxaneya metnên dînî yên kurdên yarsan û Şahnameyên Kurdî wekî teorî û destpêkekê bi kurtasî hatine behskirin bo têgihîştin û nezereka berfîrehtir ya berdewamîya gotarê. Di çarçoveya edebîyata goranî/hewramî da, di bin banê wan her du kategorîyan da, bi awayekî miqayeseyî ligel Şahnameya Firdewsî, kesayet û heyberên mîtolojîk hatine destnîşankirin ku hebûna heyber û mexlûqatan û şecere, erk û rolên kesayetan hatine diyarkirin û şirovekirin. Hem behsa kesayetên îranî/kurd hem jî turanî/nekurd hatîye kirin.

Gotara dawî ya kitêbê ya Ahmet Kırkan e bi navê “Motîfên Mîtolojîk di Edebîyat û Folklorê Kurdî ya Zazakî de”. Kırkan di çarçoveya 8 motîf û karakterên qadên wekî folklor, edebîyata nûjen û klasîk ên edebîyata zazakî da, li pey şopa motîf û karakterên mîtik çûye û di metnên edebî da ew destnîşan kirine û şirove kirine. Ew balê dikêşe ser kêmbûna xebat û lêkolînên mîtolojîyê di zazakî da. Metnên ji bo destnîşankirina motîf û karakteran hatine dayîn, rasterast bi zazakî hatine dayîn û îdeolojî û tercîhên nivîskarên li ber çavan nehatine girtin, armanc tenê ew bûye ku motîf û karakterên mîtik di metnên zazakî da bêne destnîşankirin. Herçiqaq hemî karakter û motîfên mîtik ên kurdo-îranî di zazakî da neyêne dîtin jî, heta radeyekê, çend motîf û karakter di edeb û cîhana zazakî da jî têne dîtin ku hebûna wan îşaret bi hafîzeyeka kolektîf ya kurdan dike di çarçoveya mîtolojîyê da. Herwiha mîten Rojhilata Navîn jî di edebîyat û vegeerên zazakî da têne dîtin.

Wekî encam, di kitêbê da 8 gotar ji aliyê 7 kesan ve hatine nivîsîn. Her gotarek, di qadeka cuda ya edebîyatê da behsa hebûna mît, hêman û kesayetên mîtîk yên kurdo-îranî dike di cîhana kurdan da (kurmancî, zazakî, goranî, soranî). Hebûna vê xebatê di qada mîtolojîya kurdî da heta radeyekê bersiv e bo wan nêrîn û îddîfayan ku tê gotin ew naverok, metn û karakterên mîtîk yên cîhana îranê aîdê Îrana niha ya netewe-dewlet e. Dema em dibêjin çand, cîhan û edebîyata Îranê qest ne welatê Îrana aniha ye; teqabilî cografyayeka berfireh dike ku berê kurd û faris û çendîn etnîsîteyên din bi hev ra lê jîyane. Kitêb, bi giştî li ser hebûna naverok, karakter û motîfên mîtîk e ku di çar zaraveyên kurdî da îşaret bi hebûna berbelavbûna mîtolojîya kurdan dike di bin banê mîtosa kurdo-îranî da, yanî tê îsbatkirin ku mîtosa li cografyaya Îranê berbelav e, ne aîdê miletekî lêbelê ew aîdê cografyayekê ye kurd ji beşek ji wê cografyayê ne.